hezkirin mirovan berve hev tîne, ne li hember hev radike, jineke di malbeteka bi vî rengî de tîmar bûbe, belkî cegera li hember hev rabûnê jî pêre tunebû ye, bêguman bi dizî, û tirs dijiya .

Me digot, û em dibêjin : firotin û kirîna jinan şerm e, zewaca bê dilê wan ne rast e, lêdan û îhanet, û newekhevî jî ne di cîh de ne, ma gelo, kuştina keçeke bi vî awî, çî ye ? rû-reşîyeke civakî, olî, û gelî ye. Em di sed sala bîst u yekan de dijîn ! hêdî êzdî jî keçên xwe bi kevir-lêdan a heya bi mirinê bi kar tînin ! ! ! wey heft xaliyên germ li serê olperestên nezan be .

Di siha rêjîma olî, tarî ya Îranî , û hin welatên îsmalî yên din de jî, jin bi vî awî li çate-kolana, an meydanên bajaran têne kevirkirin, da ku ji hemî jinan re bibin ders, û 'ibret, ku karên wiha nekin !

Divê em, bizanibin ku mesele bi vî awî çare-ser nabin. Divê li ser tîmar kirina keç û kur wer e siknadin, divê rolê jinê bêhtir di civakê de were naskirin ; tirs û fedî ji nav malê rabe ; dan-standin bê zor û bê siwa bin ; nermahî û ferahî di hişê me de ciyê hişkbûn û tengayiyê bistîne; da ku em di ronahiyê de meselan çare ser bikin û ne bi kûranî û di tarîtî yê de gunehên gewre bikin; yan na çawa kerê me yê kulek bi hespên xelkê yên beza re dakeve meydanê .

Kurdistana başûr, di Rojhilata navîn, di dunyayê de deng daye ; li ser tilfizyon, di medya (î'lam) û enternêt ê de, bi qencî ciyê serbilindahiya me hemî kurd a ye çirûskên wekhevî demokrasî û azadiyê tê de vedibrûsin ; û dilê mirov rihet û şah dikin.Deng dana nûçe ya kuştina keça kurd, Du'a ya êzdî, li ser entirnêtê û di medya Ewripî de, tu carî nakeve çarçwa xizmeta serbilindiya gelê Kurd .

Di civakên sîvîl de kuştina pisîkekê, kûçkekî, an çûkekê jî bi vî awî, bê deng derbas nabe. Hawar a me ji nûnerên Hukûmeta Kurdistanê, û ji hemû berpirsiyarên Kurd, çi mêr, çi jin ! !ku biryaran bistînin ; û ceza yên giran û sert, li hemberî van kiryarên hovane, bi kar bînin, da ku Kurdistan di hemû warên jiyanê de, bibe nimûne , û em nekvin xefkên dijminan (êzdî, mislman, 'elewî û şê'î…) û ne jî em xwe bê guneh bikin. Nezanî û şûnketina xwe jî di pişt guhên xwe re bavêjin, divê em şûjinê çavî xwe berî derziyê çavên xelkê bibînin ; ne jî rahêjên hîmên mezin û kevrikên biçûk ji bîr bikin .

Bingeha civakan, mala mirova ye ; hezkirin, wekhevî, demokrasî ji malê de dest pêdikin ; derbasî kolanê dibin, li bajêr belav dibin, û berê xwe didin hemî deveran. Divê, li çate kolan û çate rêk an, bûk û zave, gul û kulîlk, şona laşa ,bigrin , şahî û dil-xwaşî şona tirs û hovîtiyê bistînin .

Dema em têne, Ewripa, an jî, welatên din, em riweşt û xizam ('adet û teqlîdên) xwe bi xwe re tînin ; ji ber ku ew ne cilin (kincin) ku em li xwe dikin, û ji xwe dixin ; wan bi salan di hiş û laşê me de rihên xwe berdane . mirov ne dikare wan bavêje, û ne jî bi hesanî biguhêre ; heyam û civak vekiriye ku mirov wan berve guhartineke erênî bibe ; û bi şêweyekî bi rêk û pêk, yên qenc hlîne, û yên xerab jî dev jê berde; divê em çavên xwe vekin ; **D.R.(11)**